Mirinika Bê Wext

Demhat Dêrkî

Çi dema çavê min pê diket min pêjin diker ku hemû derdên civaka me li ser rûkê wê yê keser û kûr, bajêrê xwe avakirin. Çi dema min ew didît min pêjin dikir ku bagera

zagrosan di nava min da rabûye û ez di nava kevanên spî da tê me pêçan. Çi dema çavê min pê diket ber bi min ve dihat û nêzîk dibû, pêjina êşana dewrên wê yê aviz ji fêrmêskan ra, civîna nakokîyên bêçare li dora mêza çavê wê dihatin gerandin û

zelaltir dibûn. Dema pişta me diket cihana xeman di hemû peyvên wê yê neliv hatî da hîvî di sêdara bêhîvîyê da siroda mirinê digot.

Lêvên we xwe dispartin dîwarê xeydok û mijank dibûn guleka çirmisî xatir ji dîlana jiyanê xwastin. Dema peyvên birînda ji devê wê derdiketin û di şikefta guhên min da tovê xwe direşandin, firmêskên bê çare di ser dêman digindirîn, gelîyê bêbînî... û ez di her demê da bibûm barkêşê derdên wê. Her

cara ku min ew didît, dawa xwe ji derdan li ber min vale dikir û çiyakê din ji jana li ser dil zêde dikir.

- "eve dîsa te xêre Nalîn?"
- "..."
- "Xwezî min carekê tu dîtibaye û girî ne zimanê te ba, çima firmêsk û derd dibin hevalê te? Yan ewrên zivistanî li ser çavên te, yan jî peyvên birûskî ji nava lêvên te dipekin".
- "şêro ez ketime nava zîndaneke tarî, ne derî û ne pencere lê hene. Pir cara ez di fetisim, dema nêzîkî mirinê dibim ji nişkan ve careka din zindî dibim. Bi roj, her kêlî awirên bav u birayn min, berê min didin ramanên xirab. Bi şev, her ew di xewnên min da dibin mar û êrîş dihên da min bikujin. Hemû derghên jiyanê li pêşiya min hatine girtin. Tenê dojeh gazî min dikê. Hest, biryar, peyv û heta kenê min li nava malê qedexeye!Ez qedexeme, navê min qedexeye her tişt ji bo min qedexeye..!"
- "Ji bo çi? Çima dîwarê qedexe hirînê li dora te hatiye bilind kirin?"
- "nizanim"
- "Her dema ez dibînim, peyvên te set kul û birînan di dilê min da vedikin û firmêskên te dibin aveka şor û birina birînên min kûrtir dikin. Lê, dema tu bêdeng dibê nava min ji bêçaretî dikelê û ez di nava kela xwe da dibim mûmek u her kêm dibim."

Ev karê Nalîn bû. Her dîtinek wêneyek, dil dikir parçe praçe û her parçek li ber awaza firmêskan şîn girêdida. Ez tênedigihiştim. Derûnek dibû ewrên tarî. Derûnek dibû çemek ji xeman û dilê min di nava xwe da noq dikr. Jiyana min serûbin bû. Edî Nalin bûbû heval min ya her kêlî..

Dîwarên xanî, derî û pecere, dê û bav, heval û hogir, xewin meş her Nalîn bû.

Min pêjin kir ku hestên min her dixwazin Nalîn bibînin. Nizanim ew cara çendê bû ez Nalîn dibînim. Dema min vêcaraê dît, rûlkê wê ne ew dîmenên berê bûn. Rûyek bi şahî, kenek marîn li ser lêvan û peyvên bêderd. Lê, niznim çima ramanên min di kûrahiya çavê wê da li rastiyeke din digeriye. Lê, nizanim min hew dît destê min dirêjî pirça wê ya rengşevî bû û serê wê ket ser milê min. Êdî ez ne ez bûm, ne welat, ne ax u ne tiştek.. Nalîn bû her tişt. Ez, Nalîn û hestên ji agir di gla êşan dex bûne yek.. naaa, hemû jan hatin jibîr kirin dema tîjk û av hev dû hembêz kirin. Min hew dît serê wê ket ser dilê min ê wek deholê lêdixist. Wê demê du peyv ji devê min derketin

- "Nalîn, ji te hez dikim"

Bi van her du peyvan re, bêdeng bêdeng, Nalîn xatir ji min xwest û ew rastiya di çavê wê de veşartî, ma kul di dilê min da. Êdî gelek roj u heyv derbas bûn ji jana dilê min girantir dibû û Nalîn nediyar bû. Nema min Nalîn dît. Ez di nava heviya ku wê bibînim de, da ku bêjimê ezê te bixwazim, min nûçeya xwe kuştina wê bihîst! Min bawer nedikir lê rastî bû. Ev çi mirin bû?! Ew hêj can bû, hêj di buhara temenê xwe da bû. Ne wextê wê bû ku werîsê paşeraoja min biqetînê! Lê çi bikim? Edî min digot xwezî bi wan derdan, xwezî bi wan firmêskan, ne bi vê mirina bêwext. Ew çû û rastiya di çavê wê da veşartî bi xwe ra bir û dilekî tim bi jan li pey xwe hişt.